Karê Komelahî – Yek ji pêşniyarên di jînangeha Dibistanê de Zaniyarî ji bo dayik û bavan

Karê komelahî çîye û ji bo xizmeta kê ye?

Karê komelahî karekî piştgirî û şêwermendî ye ji bo şagirtan, dayik û bavan û ji bo dibistanan.

Şagirt dişê bi lez û bê zehmetî alîkarîyê û piştgiriyê wergerên. Şagirte dikarên bi tena xwe yan bi hev re di pirsên tirsê, xemê, bihevÇunê yan di pirsên jiyana tevahî şêwermendiyê ji karmenden komelahî werbigrin. Armanc ewe ku mirov bi hev re kûr û hûr li rewşê binerên û bi hev re çareyan peyda bikin.

Her wesa Dayik û bav dişên têkiliyê bi karmendên komelahî re bikin heger xema pêŞveçûna zaroka xwe dixwin yan rewŞek di dibistanê de wan bê hêmin dike.

Karmendiya komelayî dibe alîkar ji peydakirina zelaliyê re. Ew zaniyarin di pirsên pêŞveçûna zarokan de, herwesa di pirsgirêkên civakî de. Ew cihên pispor yên dikarên di her pirsekî de alikar bin diniyasên û diŞên daxwaza alîkariyê ji wan bikin.

Mamoste di rewŞên dijwar û zehmet de, heger bi Şagirtekî/ê tenê re, yan bi komekî ji wan re, dikarên bi karmendê/a kome-layê re biaxivin û gotûbêjê bikin. Heger rewŞ bixwaze dikarên bi hev re li pirsgirêkê binerên û li ser kar bikin.

Karmenda komelayî dikare ji bo tevahiya dibistanê, yan tenê ji bo polekê projeyan yan çalakiyan pêŞniyar bikin û piŞtgiriyê bidin.

Karmendiya komelahî çawe kar dike?

Karmendiya komelahî di her dibistanan de her amade ye. Çaxên xizmetkariya nivîsgeha wan xuyaye. Yan jî mirov dikare bi rêya telefonê bi wan re biaxive. Hesane mirov xwe bigehîne wan.

Şêwermendiya tekane serbest û li gorî dilxwaziyê ye. Civîna yekem dibe ku bi rêya mamosteyan were li darxistin.

PêŞniyar nehîniye. Karmendên komelahî di dibistanan de di bin nepenîtiyê de ne.

Ev xizmet bi belaŞ e.

Kengî dayik û bav dikarên seredana karmendiya komelahî bikin?

Heger xema pêŞveçûna zaroka xwe bixwin, yan rewŞeka teybet wan be hedan dike.

Leztir baŞtir e ji derengtir!

Carekê bihtir çêtire ji carekê kêmtir!

Ne her cara ku mirov pêwistî bi karmendiya komelahî hebe tê wê wateyê ku arîŞeyeke pir mezin li dar e.

psm Primarschule Mettmenstetten

Schulsozialarbeit



Roger Dietrich

Barbara Ernst

Roger Dietrich
044 767 93 33
079 126 08 50
roger.dietrich@ps-mettmenstetten.ch
Gebäude der Schulverwaltung, 2.Stock

Barbara Ernst
044 767 93 32
079 569 51 47
barbara.ernst@ps-mettmenstetten.ch
Gebäude der Schulverwaltung 2.Stock

Kanton Zürich
Bildungsdirektion
Amt für Jugend und Berufsberatung

Kurmanji